Newroz Hejmar (84) Rûpel (5) Sibat 2009z – 2620k

Azadî ji girtiyên Siyasî û xebatkarên gelê me

Yên Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de

N . " Xemxwarê Welêt

Belkîm hin bipirsin , ka çima ev dirûşma jorîn di hemî weşanên Partiya Yekîtî ya demoqrat a Kurd de li Sûriyê, çi di Yekîtî yan jî " Newroz " de , carbicar diweşe ? .

Di baweriya me de , hildana vê dirûşmê ne ji valahiyê hat , belê ew li ber roniya pir rewş , merc û sedemên xweza û nexweza hate ristin , hildan û bikaranîn . Emê rakirina wê bi vê awayî li jêr ji xwendekarên " Newrozê " re şirove bikin.

Berî hertiştî , wextê her mirovek ji dayka xwe dibe ; Ew bê zor û azad tê ser vê gerdûnê , û tiştekî xwezaye ku weha jî bijî . Û ne ji mafê tu hêzê ye , ku azadiya wî jê bistîne yan biqoprîne . Hêjaye em gotina " Omer Ibin Elxetab "di derbareyî azadiya mirovan de bi bîra xwe wînin: " Çawa hûn kanin mirovan kolebikin , û dayikên wan ew azad anîn" .

Li aliyê din çiqas rêxistinên sêvîl û mafên mirovan hene , tevan li ser azadiya siyasî û nêrîna mirovan tekûz kiriye , û ji ber ve dixebitin jî .

Herweha di pir ciyan ji lîsta mafên mirovan de jî , ciyekî bilind standiye . Û destûrên gelek dewlet û civakên şaristanî jî bergeheke mezin dane vê mafê .

Li nik wan tiştên jorîn , em bawerin ku çi civak û dewletên di dîrokê de , ku azadî û nêrîna xelkên xwe parastine , û rêzdariya wan girtine ; Ew pêş ve çûne û di dîrokê de jîndar bûne . Ev dewletên Iskendenavî û Ewropî jî , mînakinî ronak in .

Bervajî wê jî dewletên ku mirov û xelkên nav xwe civilandine , binpêkirine , û nêrînên wan di dermafên tevaya pirsgirêk siyaset û jiyana welêt de , bi rêz negirtine ; Ew dewlet paşdemayî mane , bi pêş neketine û şaristan ava nekirine . Piraniya dewletên Ereb û Misilman nimûne ne . Wek tê gotin jî , dewleta ku mirovên xwe ne azad , ew dewlet jî ne azad e . Yanê em bawerin ku parastina azadiya mirov û miletan di dewletan de , bi awakî zagonî , nîşana afrandin , pêşketin , hêzbûn û yekbûna wê dewletê ye .

Wêlomê Partiya Yekîtî ya demoqrat a Kurd li Sûriyê , ew diruşma hildaye û di ber de dixebite , û hercar jî di weşanên xwe de , bi bîra xwendevan , heval , hogir û dostên xwe tîne , û dibêje : Çênabe tu kes bo nêrîn an helwesta xwe ya siyasî were girtin û zîndankirin , û yên di girtîgehên Sûriyê de , ji bo berjewandî û paşerojeke xweş ji vê welatê me tevan re – divê azad bibin û bêne berdan .